Ev JimareyaBanqê ye

JimareyaBanqê şiklekî e-nasnameyê ye ku destûrê dide şîrketan, banqeyan, sazî û dezgehan ku takekesan nasnav bikin, û li gel wan bi rêya înternetê peymanan çêbikin. JimareyaBanqê Jimareyeke elektronîk e ku dişibe pasaportê, belgeya ajokariyê an jî belgeyên din ên nasnameyê yên fîzîkî .

Ev e-nasname ji hêla banqeyan tê dayîn.

Her şexsê ku xwedî Jimareya Nasnameyê ya Swêdî be dikare ji banqeya xwe JimareyaBanqê wergire. JimareyaBanqê xwedî heman nirxê ye û ji kîjan banqê jî hatibe standin bi heman awayî tê bikaranîn.

JimareyaBanqê bi berfirehî tê bikaranîn

Banqeyên ku JimareyaBanqê dide takekesan Danske Bank, ICA Banken, Ikano Bank, Handelsbanken, Länsförsäkringar Bank, Nordea, SEB, Skandiabanken, Sparbanken Syd, Swedbank û Ålandsbanken ne. Bi tevahî, ev banqe xwedî 8 mîlyon mişteriyên banqeya înternetê ne ku dikarin JimareyaBanqê li ser înternetê-û banqeya mobîl , li gel saziyên gîştî, şaredarî û şîrketên taybet bi kar bînin. Di sala 2017'an de, tê texmînkirin ku JimareyaBanqê dê bi qasî 2.5 mîlyar caran bê bikaranîn.

Piraniya şexsên ku îro e-nasnameyê bi kar tînin JimareyaBanqê tercîh kirine.
Dabînkerên din ên e-nasnameyê jî hene, wek nimûne Telia yek ji wan e.